

BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDÎSTANÊ LI SWËD

liberxwedana
girtigeha
diyarbekrê



Serokê belediya Diyarbekir MEHDÎ ZANA û hevalên xwe dî mahkema leşkeri de..

BERBANG

HEJMAR 15/83

SAL 2

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWËD

NAVEROK

Liberxwedana	
Girtigeha Diyarbekrê.....	3
Çend gotin li ser	
bineh û diroka senet.....	7
Serburiyek ji şerê	
Berude.....	10
Kurteserguzeştey	
jîyani Goran.....	12
Helbest.....	14
Dumilki di daçek.....	15
Çente.....	17
Namên xwêndevanan.....	18
Serpêhatiya	
berxê çavreş.....	19
Şeva reş.....	21
Xaçerêz.....	22
Mendalê Mamoste.....	23



Berpîsiyar
A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan
A. M. GILLY

Raxistina Nîvisaran
SEYRAN Ú GULBAHAR

Redaksiyon
KEYXUSRO SİPAN-MAHMÛD
LEWENDİ-BENGİN BOTANI
ŞORİŞGÊR ESKERİ-ROZA SEYRAN

○
BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet—Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Riza Alan—Layout: A. M. Gilly—Slättning: Seyran och Gulbahar.

ADRESS
Kurdiska Riksförbundet,

Tunnelgatan. 14, 3 tr.
111 37 Stockholm/SWEDEN
TEL : 08/ 11 23 42

Prenumeration: Medlemmar
50.- kr/dr. Övriga 100.- kr/år.
Postgiro: 64 38 80-8

BIJI LIBERXWEDANA GIRTIGEHA DIYARBEKRÊ !

Girtiyan siyasi yên girtigeha leşkeri ya bajarê Diyarbekrê roja 2. ilonê ketin greva birçibûnê. Vê carê — ne wek carênu buhuri — liberxwedan bî awayeki yekbûyi, bîhêz û bî zanin hat domandin. Liberxwedan li diji zorddestiya karbidestêna faşist û ji bo hin daxwazêñ zelal û berbiçav bû. Deng û olana wê, di demeke kurt de derket derveyê girtigehê û li çar aliyan dinê belav bû. Karbidestêna faşist mecbûr man, hin daxwazêñ girtiyan qebûl kirin.

Merivên girtiyan, hevalên wan û gelê me bî tevayı dit ku di bingehê de, yê qels û bizdok dujmîn e; ne têkoşer û pêşengên rizgariyê ne ! Jî ber ku wan di nav çar diwanan de dujmîn bî bin xist. Jî ber ku wan di bin çavdêri û esareta dujmîn de tevgera xwe organize kirin û bi ser ketin.

Bila her biji serketina wan !

BERBANG

BERBANG

NAVNISAN

Kovara Kurdi, Xwedi : Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd. Buha : 5 Kron, Abona salekê : 50 Kron, 30 DM.

Berbang, Tunnelgatan 14, 3 tr.
111 37 Stockholm/ Sweden.
Tel : 08 / 11 23 42
Postgiro : 64 38 80-8

RÄDDA LIVET PÅ DE 700
HUNGERSTREJKANDE

JUTISKA FÅNGARNA

DIYARBAKIR - KURDISTAN

liberxwedana
girtigeha diyarbekrê

û greva pıstgırıya wê lî
göteborgê

A. Roja Alan

GIRTİYÊN SIYASI YÊN GIRTIGEHA LEŞKERI YA DIYARBEKRÊ, ROJA DUDUYÊ İLONÊ DEST BI GREVA BİRÇİBÛNÊ KIRIN. LI GOR NÛÇEYÊN KU GİHANE ME, GREVA GIRTİYÊN DIYARBEKRÊ VÊ CARÊ ZAF RIND HATIBÛ ORGANIZE KIRIN, Û HIN DAXWAZÊN GIRTİYAN HATIN QEBÜL KIRIN.

ROJA 15. İLONÊ, KOMELA KURDÊN GÖTEBORGÊ, BI ALIKARIYA HIN KES Û HÊZÊN WELATPARÊZ VE, JI BO PIŞTGIRIYA LIBERXWEDANA GIRTİYÊN DIYARBEKRÊ DEST BI GREVA BİRÇİBÛNÊ KIR. GREV, DI DÛ 8. ROJAN DE GIHA ARMANCÊN XWE Û XELAS BÛ.

Dî roja 2,5,6,7, û 8 ê llonê de li bajarê Diyarbekrê mahkemê n hêzê n çep û welatparê z, yê Kurdistanê û Tirkiyê domkirin. Dî van mahkeman de, gelek girtiyan ilan kîrin ku ji roja 2' yê llonê ve, bî daxwazê n jêrin, dest bî greva birçibûnê kîrine. Daxwazê n girtiyan ev bûn:

- 1- Lî diji işkencê,
- 2- Lî diji cezayê tecridê yê bê sinor,
- 3- Jî bo mafê bî dest xistina derman û alikariya doktor,
- 4- Jî bo mafê ziyarê,
- 5- Jî bo ku weki girtiyan siyasi bên qebûl kîrin û li gor vê statu- yê muamele bîbinin.

Lî gor nûçeyên ku ji merivê n girtiyan û parêzerên wan gihane me, hinek ji daxwazê n girtiyan bi ci hatine.

Wek ku tê zanin, beri vê grevê ji çend grevên din ji hatibûn kîrin. Û dî van grevan de gelek girti

şehid ji bûbûn. Lî, ev grev giş, bê i ku li tevayıya girtigehê belav bîbin û bigihijin armancê n xwe, ji aliye karbîdestê n girtigehê ve hatun teng kîrin û vemirandin. Lî karbîdestê n girtigehê vê carê ni-karibûn liberxwedana girtiyan veşerîn û vemirinin. Bî gumana me, hin ji sedemê n serketina grevê en in:

1-Grev vê carê gelek rind hatibû organize kîrin. Her beşeki girtigehê ji grevê hatibû agehdar kîrin. Grev wulo hatibû plan kîrin, ku dikaribû demeke gelek direj ji dom bike, ji ber ku her beş li gor dora xwe diket grevê, ne ku hemû bî hevûdu re..


2- Girtiyan vê carê, nûçeya grevê dî demê de û bî awayek gelek bî tesir deranê n derve. Cara yeke min li Tirkiyê, wan mahkemê mecbûr kîrin, ku giliyên li ser işkencê derbasi protokolê n xwe bike. Ev protokol, dawiyê ketin destê parêzeran û dî demeke kurt

de gihan rojnamevanê n welatê n Awrûpa.

3- Meriv û nasê n girtiyan vê carê bî awayeke gelek aktiv alikari û piştgiriya girtiyan kîrin. Dî sê rojê n cejna Qurbanê de, nêziki hezar kesi li dora girtigehê civiyan û bî xwe ji ketin greva birçibûnê. Dawi ji hemû bî hevûdu re heta mala qumandanê idara orfi ya heremê meşîyan.

4- Liberxwedana girtiyan nêziki hilbijartimê nîsti hatibû destpê- kîrin. Cûnta faşist, li nav welat û derveyê welat propaganda "derbasbûna demokrasiyê" geş kribû. Eger liberxwedana girtiyan bî darê zore, bî şehid kîrina girtiyan - vemirandana, dibû ku hukmê propagandaya "demokrasiyê" kêmîtir bibûna. Cûntayê dizanibû ku, di dawiya meha llonê de, rewşa Tirkiyê û grevên girtiyan Ankarakayê û İstanbulê, wê dî civina Konseya Awrûpayê de bên peyivandin.





Dü 15'ê ilonê de, bî inisiyatiwa Komela Kurdêñ Goteborgê, 24 pêşverû û welatparêz, li meydana nivê bajêr "Brunnsparken", koneki gelek fireh vegirtin. Bî vi awayi 24 welatparêzan, ji bo pişt giriya greva girtiyêñ Diyarbekrê, dest bî greva birçibûnê kirin. Ev grev, di dû 8 rojan de ghişt armancêñ xwe û bî konferanseke gelek serketi ve xelas bû.

Komela Kurdêñ Goteborgê, ji bo idarekirin û meşandina grevê, komiteyek piştgiriye pêk anibû. Vê Komitê, beri destpêkirina grevê beyaneki (ji bo Radyo, TV û rojnaman) û belavokek belav kir. Lî gor van beyanan, daxwazêñ grevê weha hatibûn formule kirin:

"1- Divê hukumeta Swêd, derheq greva ku niha li girtigeha leşkeri ya Diyarbekrê têt ajotin, beyaneki vekiri û resmi bixwaze.

2- Divê Xaça Sor a Swêd inisiyatîv bigre û bixebite da ku Xaça Sor a Merkezi, delegasyonekê bîşine girtigeha leşkeri ya Diyarbekrê.

3- Divê Radyo û Televizyona Swêd, nûçeyâ greva girtiyêñ Diyarbekrê biweşinin û liberxwedana girtiyan taqîb bikin.

GREVA LI GÖTEBORGÊ



Hetâ ku ev her sê daxwazêñ me bî cih neyên em dê greva xwe bidominin. Yani greva me bêsinor e".


Jî rojêni seri ve jî hemû parti, sendika û rêxistinêñ din yêñ li Swêd re name û telegraf hatin şandin. VPK (Partiya Komunist) jî Evren re nameyek şand û doza bîcîhanina daxwazêñ girtiyêñ Diyarbekrê kir. Ü piştgiriya xwe ya jî greva Goteborgê re nivisand.

Serekê FP (Partiya Gel) - yê wê çaxê - Ola Olsten jî grevê re mesajekê şand û got "ez heta dawiye piştgiriya daxwazêñ we dikim û hûn dikarin rojnamevanan jî min re bîşinîn". Gelek rêxistin û partiyêñ din ên Swêdi, Türk, Kurd û hwd. mesajên alikari û piştgiriye şandin.

Bî hezaran nav û imze hatin cîvandin û ji sefareta Tirkîyê re hatin şandin. Piraniya rojnamêñ Swêdê li ser grevê bî ferehi nivisandin.

Radyoya Swêd, 3 roj di dû grevê re muxabirê xwe şand Diyarbekrê. Nûçeyêñ vi muxabiri, direk jî Tirkîyê, 5-6 caran di radyoya merkezi de hat weşandin.

Radyoya lokal, her roj nûçeyêñ grevê bî hin reportja û malûmatan ve belav kir. →



Radyoya Finlandi, bı reporta
jekē ve cihek fereh da grevē..

Programê n Türkî, yê n Radyo û
Televizyonê nûçeya grevê çend
caran belay kîrin.

Televizyona Swêd, li cihê grevê bî du kesên ku berê li girtigeha Diyarbekrê razabûn û işkence ditibûn re, reportaj kîr û dî programê nûçeyan de (Väst Nytt) cihek gelek fereh da grevê.

Xaça Sor a Swêd soz da Komita Grevê, ku ew dê ji bo şandina delegasyoneki bixebeitin.

Hukumeta Swêd, bî wesita Wezirê derive yê welat ve, ji Komita Grevê re mesajeki şand. Wezirê derive yê Swêd bî kurti got, ku "Swêd ji zû ve ye ku ji bo mafêن mirovi li Tirkîyê dixebite (...) Agahdar e ku li diji mafêن mirovi gelek súcen hov têن kîrin (...) Lew re, hukumeta Swêd he-ta iro çewa li Koma Netewan û li Konseya Awrûpayê xebitibe ji ni-ha pê ve ji wê xebata xwe bido-mine (...) û dê vê bûyerê ji bibe Konseya Awrûpayê (...)"

Roja 22 İlönê Konferansek
hat pêk anin û bî wesita Radyoya
Lokal ji xelkê bajêr re, ji bo ali-
kariya wan ya maddi û manewi
hat spas kirin.

Dı Konferansa roja dawin de 3
rojname, radyoya merkezi, rad
yoya lokal û Televizyona Swê di û
Türki besdar bûn.

Lî ser vê pêşveçûnê, Komita Grevê giha ditina ku grep ghiştiye armancê n xwe û dî roja 8' an de bûrvare xelaskirinê da.



This image is a collage of several newspaper clippings from 1983, all reporting on the Kurdish hunger strike in Sweden. The clippings are arranged in a overlapping, non-linear fashion across the page.

1. **Top Left:** A large banner headline from "Dagens Nyheter" dated "ONSDAG 21 SEPTEMBER 1983 VECKA 38 1983". The main headline reads "VI FRUKTAR EN MASSAKER" (We fear a massacre). Below it, a sub-headline says "Kurderna som hungerstrejkar i Göteborg" (The Kurds who are on hunger strike in Göteborg).

2. **Top Right:** A smaller clipping from "Dagens Nyheter" dated "MÅNDAG 12 SEPTEMBER 1983 VECKA 37 1983". It features a black and white photograph of a group of people, likely Kurdish refugees, sitting together.

3. **Middle Left:** Another "Dagens Nyheter" clipping from "ONSDAG 21 SEPTEMBER 1983 VECKA 38 1983". The main headline is "Turkar i sympatistrejk" (Turks on sympathetic strike).

4. **Bottom Left:** A clipping from "Arbetet" dated "ONSDAG 21 SEPTEMBER 1983 (vecka 38) N:o 69". The main headline is "Hungerstrejkar för kurdiska politiska fångar" (Hunger strikers for Kurdish political prisoners).


5. **Bottom Right:** A clipping from "Arbetet" dated "ONSDAG 21 SEPTEMBER 1983 (vecka 38) N:o 70". The main headline is "Hungerstrejkande kurder till sjukhus" (Hunger striking Kurds to hospital).

6. **Right Side:** A vertical column of text from "Arbetet" dated "ONSDAG 21 SEPTEMBER 1983 (vecka 38) N:o 70". It discusses the fate of Kurdish political prisoners, mentioning their hunger strike and subsequent deaths.

7. **Bottom Center:** A small photograph showing a group of people, possibly Kurdish refugees or supporters, gathered together.

8. **Bottom Right Corner:** A small inset at the bottom right of the "Arbetet" clippings provides additional context about the Kurdish situation in Sweden.

ÇEND GOTIN LI SER BINGEH Ú DİROKA SENET



Fırat Ceveri

Di vê nivîsara xwe de min xwest, ku ez bi kurtebirî çend gotinan li ser bingeh ú dîroka senet binivîsim. Di be ku di rewşa îro de, nivîsên zanistî, dîrokî ú siyasi ji zimanê kurdî re giran bê. Lê mana xwe ne ew e, ku emê destêñ xwe girê bidin ú li bendî dewletek kurdî bisekinin. Mirov di pêşdexistina tiştan de roleke mezin dilîze. Hin keşen tûj wisa dibêjin: "Yaho ma em ê bi helbest û çirokan xelas bibin, ú bi kurdî... Ma kî ji me ji kurdî fêhm dike, ku we zor daye nivîsandina kurdî ?" Gelo mirov çi bersivê bide van mirovan ? Ez ji wan mirovan dipirsim: "Gelo hun ji gelekî bê ziman re ci dibêjin ? Gelekî ku zimanê wî tune be, senet ú kultura wî tune be, hun ji wi gelî re ci dibêjin ? Gelekî ku ziman, senet ú kultura wî tune be, ma gelo ew gel e ? An wek dîrokzan ú civatzanan rohnî kirine, hoyêñ (şertêñ) netewetiye çine ? Ma yek jê ne ziman e ? Gelo mirov kane ji civatek bê ziman re, bê kultur ú senet re bêje netewe ?

Rast e, dibe ku tiştan îro bi kurdî têñ nivîsandin ne wek ên welatêñ xwedî dewlet bi pêş de be. Lê mana xwe ne ew e, ku ev xerab e ú em dev ji nivîsandina kurdî berdin. Her çigas ne di dereca wan de be, disan ji alîki ne kêmî wan e. Gava ku em hoyêñ xwe ú hoyêñ wan bidin ber çav, em kanîn bêjin, ku weke ên wan ú ji ên wan bi pêş de tir e.

Mayakovski wisa dibêje: "Gava ku helbestkarekî Alaska ú helbestkarekî Yalta du helbestêñ weke hev binivîsin

"herdu helbest weke hev bin ú di derækê de bin, ez ê helbesta yê ku Alaskayê nivîsandiyê ji helbesta yê Yaltayî baştır bibinim. Ji ber, gava ku yê Yaltayî di hoyêñ baş de ú di doreke xwes de helbestê dîniyîsine, yê Alaska yî ji serma diqefile ú ji serman tiliyêñ wî pénusê (qelem) nagire". (1)

Gelo ev çend peyvîn Mayakovskî ji bo me kurdan ji derbas nabin ? Niha ku em kurdan ú tîrkan, an kurdan, ereb ú farisan bidin ber hev, ma rewşa ne wisa ye ? An bi gelempêri, em kurdan ú welatêñ serbixwe ú xwedî dewlet bidin ber hev...

Gelo ku ew helbest, çîrok, roman, dîrok ú hwd. dîniyîsin, ma di bin çîşaw ú tîrsê de ne ? Gelo ma ew afirandinêñ xwe di bin saw ú tîrsê de dîniyîsin ? Na, mirov tam kane berevajîya wê bêje. Ew bi alîkariya dewletê, bi alîkariya ekonomî ú moral dîniyîsin.

Lê em kurd ? .. Li wefet ne nivîsandina pirtûkan, ma gelo gengazên (şimkan) me ú nivîsandina nameke kurdî heye ? Ew kesen wisa qureti ú ziman-direjtiyê dîkin, gelo bi dijwariya nivîsandina kurdî zanîn ?

Ji ber vê yekê, ji bo ku hin heval rola senet ú edebiyatê bê qîmet nebînin ú bi çavekî nizim li zimanê xwe nenihêrin, min hewcedariya nivîsandina çend gotinan dit.

Bi gorî nêrînen civatzan ú dîrokzanan, senet hebûnek ku bi dîroka mirovantiyê re hatiye meydânê. Senet cawa

ku bi dîroka mirovantiyê re hatiye meydânê, wisa ji bi mirovan ve girêdayî ye. Pêşketina mirovan ú xebata wan ya kolektîv reng ú rewşekê nu da senet. Senet bi pêşketin ú guhertina civatan re tê guhertin ú di her civateke rolekê dileyize. Senet neynika (eynik, mirek) jîn ye. (2)

Ji bo ku em rola senet ya di civatêñ cihê cihê de bînîn ziman, divê ku em bi kurtebirî rewşa civatan ji bînîn ziman.

CİVATA KEVNAR (KOMUNİZMA KEVNAR)

Weke ku tê zanîn, di civata kevnar de çek ú alet zêde pêş neketibûn. Mirov ji bo ku xwe li hember dehbeyêñ (heywan) wehşî biparasta, diva bu ku bi hev re kar bikirana. Gava ku hinekan bixwestina, ku bi serê xwe kar bikin ú bi serê xwe jiyana xwe bidomînin, nedibû, tu caran ji wan re li hev nedihat. Ew hertim hewcedarî endamîn civatê yêñ din dibûn. Bi vî awayî mirov mecbur diman, ber bi hev dikisiyaza ú bi hev re kar ú xebat dikirin. Di hundîre xebata wan ya kolektîv de, senetekî kolektîv ji dest pêkir.

Derketin ú pêşketina senet bi tiştêñ ku mirov pê jiyana xwe bidomîne ve giredayî bû. Wan ji bo ku bi hêsanî dehbe bigirtana, wêneyêñ wan li şikeftan ú li ser tehtan çêdikirin. (3)

Çawa ku di civata kevnar de her tişt malê herkesi bû ú tişteki kesan yê taybeti tune bû, wisa senet ji malê her ke-

sî bû û di xizmeta civatê de bû. Bi wê-neçkirin û hêkel çêkirinê senet pêş ket. Naveroka wêne û hêkelen wan hemû li ser rewş û jiyana wan bû. Sedema ku wan bêtir wêne û hêkel çê dikirin, an bêtir qîmet didan wêne û hêkelan ew bû, ku jîna wêne û hêkelan ji ya helbest, çîrok û hwd. direjtir bûn. Wan wêneyên xwe li ser gome û zinareñ mezin dixeritandin. Bi vî awayî jîna wêne û hêkelan direj bûn. Ku lehî û şetên avan ew li ber xwe bibirana jî, disan winda nedibûn, tenê cih diguhertin. Ji nîşê wêbê re mîras diman. An em kanin bêjin, ku senetê wan ji zarakêñ wan re mîras dima. Ji ber ku nivîsin tune bu û helbest, stiran, çîrok û hwd. (her wekî din) nedihatine nivîsandin, ew carna jê zû winda dibûn. Ku sedsalek an dusedsalek di navê de diçû, li her cihekî bi awakî dihatin gotin û carna jê jî bin de winda dibûn.

Piştî demeke alet hêdî hêdî pêş ketin. Ji dar û keviran aletêñ nû hatine avakirin. Weke mircefê, tîrvank û bîvir... Gava ku aletêñ wisa hatine aîfrandin, jîn jî hêsanter bû. Êdî hewcedariya mirovan zêde bi hêñ neman. Karêñ ku berê bîst - sî kesan dikirin, êdî bi hêsanî du - sê kesan kanibûn bikirana. Piştî ku zêde hewcedariya mirovan bi hev neman, êdî çavnebarî û xweparastinî jî derkete meydanê. Kesêñ ku alet xistin destêñ xwe, dest bi çavnebariyê, stemkarî û zilmê jî kirin. Ji aliye din, yêñ ku ji aletan bêpar, ketin bin zilm û zorê.

CIVATA KOLEDARIYÊ

Weke me li jor jî qal kiriye, senet bi guhertina civatan re tê guhertin û di her civateke de rolekê dilzê. Gava ku di civata kevnar de senet malê hemû civatê bû, di civata koledariyê de ji bin de hat guhertin. Yêñ ku aletêñ kar xistin destêñ xwe, çek û senet jî xistin destêñ xwe. Weke tê zarîn, dewlet jî wê çaxê ava dibe. Bi alîkariya dewletê, koledar din, senet û felsefe jî ji bo direjkirina emrê xwe bi kar tûnîn. Ji xwe, ji bo direjkirina emrê koledaran ya heri girîn din û dewlet bû. Serîhildan û li berxwedanêñ kolan bi zor û stema din û dewletê dihatin vemirandin û şikes-tandin.

Bi cih guhertinê û derketina bazir-ganiyê re nivîse jî dest pê kir. Pirtûk û tiştêñ ku di wê demê de dihatine nivîsandin, tenê di xizmeta koledaran de bûn. Naveroka pirtûk û nivîsen wan, disa tiştêñ ku jîna wan bêtir bidoman-

da û pergala wan li ser lingan bihiştâ cih digit. Weke tiştêñ wisa: "Divê ku mirov li hember peyayêñ mezin, mîran û berpirsyarêñ dîn ranebe. Ku mirov li hember van kesan rabe, mana xwe ew e, ku mirov li hember Xweda radibe". Ji ber ku nivîs tenê di destêñ koledaran de bû, tenê koledaran ji nivîse fêde didit. Çîrok, helbest, stran, tiyatro û hwd. jî dîsa tenê ji bo kêf û jiyana koledaran bû. Yewnan û Roma kevin yek ji van mînakan e. Bi wî awayî, koledaran bêtir kole bi destêñ xwe dixistin û bi kêf û şayî jîna xwe didomandin.

Gelo ma di civata koledariyê de tu tiştêñ kolan jî tune bû ? Senet, kultur û edebiyatek wan jî tunebû ? Befê, çawa ku kultur, senet û edebiyata koledaran hebû, wisa jî kultur, senet û edebiyata kolan jî hebû. Ew jî xwedî senetekî taybeti bûn. Lî senet, kultur û edebiyata kolan ji ya koledaran cihe û xwedî naverokek taybeti bû. Her çigas gengaziyêñ kolan û çapkirina aîfrandinêñ wan tune bû jî, disan ji devan diçû devan û ji guhan diçû guhan. Bi wî awayî stran, çîrok û serpêhatiyê wan winda nedibûn û her di nav gel de belav dibûn. Em kanin bêjin, ku pir stran çîrok, helbest û serpêhatiyê me kurdan jî xwedî dîrokek wisa kevin e. Her çigas gengaziyêñ me û çapkirina aîfrandinêñ me çenêbû be jî, disan winda nebûne û hatine heta bi iro. Lî weke ku me qal kir, li her cihekî bi awakî tê gotin.

FEODALİZM

Gava ku mirov civata Feodalîyê û civata koledariyê dide ber hev, civata feodalîyê ji civata koledariyê baştır û bi pêşdetir e. Gava ku di civata koledariyê de mafê koledaran, û kuştina kolan hebû, ev di civata feodalîyê de ji orte rabû. Dîsa, gava ku di civata koledariyê de kole weke dehban dihatin kîrin û firotin, di civata feodalîyê de ev bi awakî ji ortê rabû. Lî icar bi awakî din stemkariyê dom kir. Di feodalizmê de gundi tenê bi erdê ve giredayî bûn. Li welatêñ ku hîn dema feodalizm di-jin ev wisa ye. Ji axê pê de tu hatinê gundiyan tune. Ew tenê bi axê ve girêdayî ne. Ew bi axê re têñ kîrin û firotin. Lî gava ku mirov dide ber civata koledariyê, hindik be jî dîsa jê baştı û peşketüür xuya dike. Êdî gundi ji kuştinê û ji kîrin û firotina bi berçav azad dibin. Lî zilm û stemkarî her dom dike. Pergal dîsa di destêñ stemkaran de dimîne. Yanî guhertinê ku

çebûn, ne ku zilm û stêm ji ortê rakir û hemû endamêñ civatê kirin wek hev û azad kirin. Zilm, stêm û xwînmijiyê her dom kir.

Bi wî awayî berberiya di nav senet û edebiyata gundi û feodalan jî dom kir. Tiştêñ ku hatine belavkirin û çapkirin dîsa hemû an piraniya wan li ser direjkirina emrê tebaqa serdest bûn. Nivîskar, helbestkar, dengbêj (stranbêj) û hwd. her tim li ser direjkirina emrê tebaqa serdest digotin û dinivisandin. Wan di helbest û nivîsen xwe de nespehibûn, nepaqibûn û kofibûna gundiyan gianine ziman. Nemaze li Fransayê, di dema feodalizmê de "Chanson de geste" yan di çroken xwe de wisa digotin:

*Gundi bê biçim û ji hev de ketî ne
Kesekî wek wan ne xweşik û
nespehî nîne
Qama wan zirav e, weke sirixan.
Ruyen wan reş e, weke komire
Li paş û pêş qomilkên wan hene
Kesekî wek wan nespehî nîne. (5)*

Lî gava tebaqa serdest ev gotinê han, yêñ nespehî ji tebaqa bindest re dikirin, tebaqa bindest ne razayî bû. Wan jî li gor hêza xwe li hember wan têkoşin didan û bersiva wan bi vî awayî didan:

*Em jî weke wan mirov in.
Em jî zanîn jan ci ye weke wan. (6)*

Di vir de mirov dibîne, ku gundiyan tu caran li hember axa û began serî netewandine. Wan jî bi gorî gengazên xwe li hember wan têkoşin dane û didin. Ji xwe senet û edebiyat ne ji derveyî politikayê ye. (7) Gava ku mirov çînan û berberiya di nava çînan de bîne ziman, divê ku mirov rola senet û edebiyatê ji bir neke. Şerîn ku di nava çînan de bû ye û dibe, ne bi tenê bi çek û kuştinê ye. Her wisa bi senet û edebiyatê ye ji. Rola senet û edebiyatê girîng e. Ji ber vê yekê tabaqen serdest pêşî êrisî senet û edebiyata tebaqen bindest dîkin û senet û folklorâ wan ji wan didizin û talan dîkin. Gava ku senet û edebiyata geleki winda bibe, hingî kultura wî gelî jî winda dibe. Ku kultura geleki winda bibe, mirovantî jî winda dibe û ji ortê radibe. Hingî armancêñ tebaqen serdest bi cih têñ.

Em di vir de çend mînakan (example) ji helbestkarêñ kurd, yêñ ku di dema Feodalizmê de jiyan e bidin. Ji ber ku problema me kurdan ne çînî bû, naveroka helbestêñ me jî ne çînî, bêtir li ser problemê me yêñ netewetiye ye. Naveroka helbestêñ me li ser dijwariya me û belengazî û pêrişaniya me ya di bin destêñ imparatorêñ tîrk û eceman e. Yek ji helbestkarêñ me, yê mezin,

Ehmedê Xanî li ser vegirkerên ecem û tirkân wisa dibêje:

Aya ji ezel Xwedê wisa kir
Eu Rom û Ecem li ser me rakir.

Tebiyetê wan eger ji ar e
Ew ar e li xelkê namidar e...

Namûs e li hakim û emîran
Tavan ci ye şair û feqîran ? (8)
Du re helbestkare me, ye mezin, ji bo yekîti u hevkariya kurdan bang dike. Ji aliye din pesne kurdan vedide u wan hers dike:

Evet pulzewi, Rom u Behri Tacik
Hindi ku bikin xuruc u tahrik

Kurmanc dîbin xwin mulleteh
Wan jek vedikin misale berzeh.

Melayê Cizîrî berî Ehmedê Xanî ye, lê navê Ehmedê Xanî ji yê Melayê Cizîrî, Eli Herîrî, Feqîyê Teyran û hwd. bêtir tê nas kirin. Navê wî ji yê wan bêtir di nav gelê Kurdistanê de belav bû ye. Sedema ku ew wisa di nav gel de hatiye naskirin û navê wî belav bû ye ew e, ku wî bêtir li ser vegirkeran nivîsandîye. Lê mana xwe ne ew e, ku Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran an Eli Herîrî di nav gel de nehatine naskirin û tiştên wan nivîsandine bê qîmet in. Melayê Cizîrî di helbestek xwe de wisa dibêje:

dil geh can diben terke te ten,
Nikarin yexma û talanênen xelet,
Meşrebê tirkân furat û nîle kir,
Teşne leb çû terefe Osmanî xelet.

Rom û Ecem ji her teref,
Ceng û siwaşe wan bi xef
Hindi û zengî sef bi sef,
Hatne ber liwayê zulf.

Lazim e li sultan û mîran
Pirskin li halê esîran. (9)

Bi a min ev herdû helbestên van mamostan ji bo mînakê têr dîkin. Lê ji aliye din min dixwest, ku ez ji helbestkarên tebaqa serdest hin mînakan bîdim. Lê min tu helbestên kurdan, yê tebaqa serdest, ku gundiyan nebaş û nespehi nîşan didin bi destên xwe nexist. Weke me li jor ji qal kiriye, tiştên ku me kurdan ji gelén din diqetîne, mersela netewetiye ye. Em kanin bêjin, ku helbestkarên me, yê kurdan, yê ku di sedsaliya nêvi de jiya ne, pirêwan, ji tebaqa serdest tê. Lê her çiqas ew ji tebaqa serdest bû ne ji, dîsa ew bi xwedî ûcdan derketine û ji bo welatê xwe û azadiyê nivîsandine û ser kirine.

KAPITALİZM

Di kapitalizmê de du heb çinêni niken - nû derdikeyin meydanê. Burjuwazî û proletarya. Ev ji civata koledariyê de dest pê dike, ta bi civata kapitalizmê. Pişti komünizma kevnar, guhertinênu ku di civata de çê dîbin, ne ji bo azadi û serbixwebûna mirovan e. Di civata koledariyê de koledar (xwedî kole) û kole. Di civata feodalizmê de feodal (axa, beg) û gundi. Di civata kapitalizme de jî burjuwazî û proletarya hene. Yanî her tim du heb çinêni ji hev cîhe û li hember hev hene. Lê her civatek ji ya din baştı û bi pêş de tir e. Gava ku di civata koledariyê de kole weke dehban dihatin kuştin, kirin û firotin, ev dicivata feodalizmê de ji ortê rabû. Gava ku di civata feodalizmê de gundi tenê bi erdê ve giredayî bûn û tu azadiya wan tune bû, ev di civata kapitalizmê de ji ortê rabû. Di civata kapitalizmê de, pişti berberiya sermaye, êdî bi awakî azadiya karkeran çê bû. An em kanin bêjin, ku demokrasiya burjuwazî ava bû.

Karker û proletarya hindük be ji, dîsa ji vê demokrasiya burjuwazî karekê dîkin. Nivîskarên çîna karker kanin ji xwe re komele û sendîqan ava bikin. Ew kanin di hundir van komele û sendîqan de bi azadî bixebeitin, binivîsin û têkoşînê bidin. Lê, mixabin, ev azadî pir dom nake. Gava ku burjuwazî çav li xebata wan, ya ji bo mirovantiyê û civatek bê çînî dikeve, dest dide ser xebata wan û azadiya wan ji destên wan digire. Ji aliki gava ku helbestkar û nivîskarên xwe xelat dîkin, ji aliye din helbestkar û nivîskarên çîna karker digirin û afirandinêwan qedexe dîkin. Mînakên wisa li hawîrdora me, li cihanê tijene. Lê, ya herî nêzîk em kanin ji Tîrkî mînakan bidin. Di sala 1975' an de hin pirtûkên van nivîskaran hate qedexe kirin. Di vir de ne hewce ye, ku em navê pirtukên ku hatine qedexe kirin binivîsin. Lê nivîskarên ku pirtûkên wan hatine qedexe kirin ev in: Çetin Altan, Refîk Erduran, Fakîr Baykurt, Orhan Kemal, Rîfat Ilgaz, Oktay Akbal, Müzaffer Izgû, Bekir Yıldız, Yaşar Kemal, Afet Mühteremoglu, Halîl Beyhangîl, Cevat Fehmi Başkut, Mahmut Makal, Eflatun Cem Güney, Muhamrem Zeki Korgunal, Sabahattin Ali, Kemal Tahir, Tarık Dursun, Aziz Nesin, Isa Ayhan, Kemal Bilbaşar. (10)

Hin pirtukên ku ji zimanê biyanî jî hatibune wergerandin hingî hatine qedexe kirin. Ew nivîskar ev in: Jean Paul

Sartre Cengiz Aytmatov, Gogol, Maclean, Dostoyevski, Charles Dickens Vickie Collins û Albert Camus.

Gava ku mirov baş bala xwe bide, mirov de bibîne ku tirsa burjuwazî ya herî mezin rojname, kovar û pirtûkên pêşverû ne. Ji ber ku ji wan ditîrsin, wan digirin, dişewitînin û qedexe dîkin. Lê ew her çiqas pirtûk rojname û kovaren me qedexe bikin û bişewitînin ji, em tu caran serê xwe li ber wan natewînin, desten xwe girênadın û dev ji têkoşîn û nivîsandinê bernadin. Em di vir de çend mînakan ji helbestkar û nivîskarên dema me bidin. Em pêşî mînakekê ji Cegerxwîn bidin. Cegerxwîn di vê helbesta xwe de wisa dibêje:

Ey heval Robson !
Karker û rîncber cotkar şiyar bûn
Reben, perîsan bi hev re rabûn
Bi tanq û bi top diçin şer û ceng
Li her der qîrîn, li her der hewar
Li hawîr bû deng
Dixwazin azadî, serbestî, wekhevî. (11)

Gava ku mirov bala xwe bide vê mîlikî jorîn, mirov dê xweşîntemasnoyalizmê ji tê de bibîne. Ahmet Arif ji di vê helbesta xwe, ya bi navê "Li hundur" wisa bang dike:

Haya te jê heye dîwarê kevir ?
Deriyê hesin, paca kor,
Behîfa min, ranza min, zincîra min,
Ya ku ez xwe di ber de didim kuştin,
Wêna min ya stûxwar û vesîrtî,
Haya te jê heye ?
Seredanê min pîvazîn şîn şandîye,
Bêhna qeranfilê ji cigara min tê
Bihar hatiye ciyayênen welatê min.. (12)

Lê gava ku mirov ûnterasyonalist be, mana xwe ne ew e, ku mirov dê dev ji netewetiye mirov kane bibe ûnterasyonalist. Gava ku Osman Sebî vê malika jîr dibêje, mana xwe ne ew e, ku ew li hember azadiya gesen din e, an li hember xebata karker û gundiyeñ tirkân e

Dê tenê bêjîm kurt û serpîlkî
Ku çawan tirkân xwâna me vexwar
Ji tirkân sê kes xudan guneh bûn
Kemal Atatürk, İsmet û Bayar

Min divê her tu bilind bî
Ala rengîn keskî zer. (13)

SOSYALİZM

Pişti ku diktatorya proletarya ava dibe, bihişa burjuwazî ji destan tê stendin, her tişt dikeve destê çîna karker, hingî rola senet ji tê guhertin. Senet û edebiyat dibe malê hemû kesan.

Serbûriyek Ji Şerê Bêrûdê

S e l a h

Evarek ji rojên Temûzê yêndirêj 1982 an de ez bi hevalênen xwe re di Tabiyê de bûm. Li himber qiraxa derya Berûda Rojava çekênen me bi dest bûn. Ew cihê em lê bûn nê zîkî (2 km) serkomê hêzên hevre yêntevgera Niştimanî Lubnanî - Filestînî - li gor biryar parastibûn hêzê me. Li himber êrîşa Îsraîl her wekî eniya leşkerî hemî -7- parce bû li serçend hêzan hatibû belavkirin.

Şev û roj em şiyar bûn, destênen me li ser quntaxê bûn û dijmin bi hemî çekênen - esman, erd, av - li medida. Me gemiyênen dijmin ên leşkerî di avê de her dem diditîn. Agirê çekênen me nedigaştın dijmin. Lê agirê wî bi hêsanî digeşt me, ji ber tazetirênen çekênen impiyalistînen emrîkî di dest da bû.

Di wê êvarê de çend bombênen fosforî li ser me barîn, ew bomb, Koma Miletan bi biryar qedexe kiriye lê Îsraîl wek rijêmek faşist di şerê Berûdê de hemî çekênen qe-



dexe bi kar anî, wek fosforî, Nâpalm, inşitarî- irticacî, Gazi, Mikrobî.

Çendhevalênen me birîndar bûn û şewitîn. Em bi lez li birîndaran geriyan wan, civand bo bibin nexweşxanê, dema ku bombe û rakêt li cikî dîbarîn xelk dicivîn bo aîkarî bidin, bê ku bizanîn birîndar kî ne; ji ber hevkarî bi xurtî hebû di nav gelê Berûdê de. Min xwe di piştî lez û bez û çavênen tîrsê di gel 3 hevalênen birîndar di cîbek leşkerî de di rex min de leşkerek tevî şifîr û li paş me hevalênen birîndar. Berê cîbê li nexweşxanê ye, di rê de berê min li hevalan e, li ser jiyana wan bi tîrs im û dizanim birînen wan kûrin, dilînen wan xurttir dikim, nav di wan didim, di wî katî de leşkerê rex min berê xwe da min û pîrsî:

- Hûn kî ne ?

Min got:

- Em ji Hêzênen hev re ne û ji tevgera Niştimanî Lubnanî ne.

Pîrsî û got:

- Dizanim hûn ji hêzê hevre ne,

lê ji kîjan partiyê ne ?

Min got:

- Em ji (...) ne,

- yanî hûn Kurd in...

- Belê em Kurd in.

Min di ruwê wî de derxist ku bersiva min pê seyr bû û gelek ecêb bû. Ew bê deng bû, wek yekî li himber pirsek bê bersiv raweste, yan ji şev lê bigere û xwe winda bike.

Di wî katî de em gihan nexweşxanê, me birîndarênen xwe derbas kirin û bi şer û qır wan bi cî kirin. Ji ber ciyênen vale nemabûn, birîndar gelek bûn, derman kêm bû û Doktor pir kêm bûn; birîndarênen ku ne li ber mirinê bûn bi cî nedikirin. Lê ji ber heval birîndarênen fosforî bûn, ji şenê wanî baş hatin bicîkirin. Tevî mesela cî hin êşen din hebûn; wek birîna elektîfik û xwarin û karkerênen nexweşxanê.

Piştî bicîkirina hevalan derketim. Li ber dergehê xwarê min ew leşker li himber xwe dît, pîrsa rewşa hevalan kir, min xwest si-

pasî wî bikim û xatir jê bixwazim, lê ji min pirsî:

- Bi ku ve ?

Min got:

- Diçim ba hevalan, ser qıraxê behrê.

Got:

- Fermo bi cîbê te bighinim.

Siwanî cîbê bûm, min zanî ew leşker dixwaze dan û sitandina me a kevin temam bike û dest pê kir û got:

- Wek diyar e ji zaravê te, tu xelkê Sûrî ye.

- Belê ez Sûrî me û min eskerî ji mêt de kiriye.

- Tu li vir çi dike ?

- Berî êrişa Îsraîlê min li karxanevê kar dikir. Ji destpêka şer ve kar nema û pir karkerên Libnanî û Sûrî çûn malêñ xwe. Pişti min hin dostêñ xwe dîn ji Partiya (...), min zanî ku ew Partiya kurd bir yar biriye ku li himber Îsraîlê şer bike, li gel tevgera niştimanî û şo reşa Filestînî û leşkerî Sûrî. Min jî bîryar da ku bi wan hevalêñ Kurd re şer bikim û bi wan re bimînim. Û wacib e xwe ê niştimanî pêk bînim, her wekî min got ez dizanim çek bi kar bînim ji ber li eskeriyê fêr bûme.

Cîb nêzîkî cihê hevalan bû, ew leşker berê xwe da min û got:

- Fermo ez te dawa dikim cihê xwe, bo bi hev re çayê vexwin. Di pêşde min nedixwest pê re herim, lê çûm. Pişti gihan mekteba wî, ji bekçî û leşkeran min zanî ku ew efser e (zabit) û berpirsiyar e. Pişti bixêthatinê bi germî efser dest pê kir û got:

- Pişti me hev nasî û bûn dost, ez kîfxweş im, nemaze em hemî fro li himber yek dijiminî radiwestin, û em zarwêñ yek welatî ne, dixwazim bi rûnî û serahet bêjim hin tişteñ te gotin di serê min de cî negirtin û min nikarîbû tê bigîhem. Dixwazim bi zanim; çîma hûn şerê Îsraîlê dîkin ? Tu Kurd ê Sûrî ye, hevalêñ te Kurdêñ Libnan in û Kurdêñ Turkiyê ne û belkî Kurdêñ İran û İraqjî di nav

we de hebin, çi têkiliya we bi Erebêñ Filestîn re heye ? Yan jî Erebêñ Libnanê ? Bibûre û meleyde ku bêjim tişte ez zanim û ji min re hatiye gotin: "Kurd parçebûnxwaz in û dijê Ereban e û naxwazin yekîtiya Ereban pêk bê, ji ber wisa ez mame şaş di navbera baweriye min ï kevn li ser Kurdan û tişteñ ku tu ji min re dibêje û bi çavan dibînim. Hêvîdar im ji, minre diyar bikî bi rengekî firehtir.

Tevî ez di hudirê xwe de hêrs bûm lê eşkerebûna (serahet) vî efserî hişt ez bêjim:

- Ez eşkerebûna te sipas dikim û dizanim tu ji dilek pak û bawerî pirsîn xwe dibêje û dizanim jî ku tu li baweriyeñ kevin bi şek ketiye, dixwazim bêjim ku koledar û împeryalizm ji mêt ve hewl didim ku dilmaniyêñ navbera Kurd û Ereb gur bikin û li ser wan bike-nin, bo hemiyan qels bikin û tu zanî ku rijê mêt borcîwazî kevneperest di destpêka azadbûna Sûrî yê de, di vî warî de pir gav avê tin. Yek ji wan gavan weşandina mafêñ danışgehî ji Kurdan, û kembera Erebî (min bi dirêjayî jê re got) ew jî rijê mêt kevneperest cidabûnperist pê rabû û bawerîyêñ çewt û derew li ser Kurdan belav kirin. Heya gotin Kurd Îsraîlê dudi yan e. Heya iro jî mixabin hin xêzik û girup û kes li welatê me hene di wê baweriya genî de ne. Ew jî kevneperest û şovenîst in, dixwazin biratiya Kurd û Ereb hilweşînin her wek em dizanin dijminen her dû gelan yek e û jiyana wan yek e, bi wan nêrînêñ şovînî û nijadperistî dijî Kurd dixwazin biratiye û hevkariyê rakin. Gelo çîma karker û cotkar û belengazên kurd ji hemî mafêñ siyasî, civakî, kültürî, demukratî û çînî bêpar in ?

Kurd li Libnan û li her cih û war dostêñ Ereb in û bi mafêñ gelê Filistîn re ne. Hêzên Kurd ên niştimanî û pêşverû dostêñ tevgera azadîxwazî Ereb in, li vir

partiya (...) endamê di tevgera niştimanî Libnanî de ye, bi şoreşa Filistînî re peywendiyêñ wê ên têkoşînî hene, ev partî xebat dike û xwîna xwe dirêje bo yekîti û demokrasiya Libnan û ev welat bimîne welatek Erebî. Li vêder parçekî Kurdistanê nîne, xebata Kurd li vêder xebateke milî nîne. Lê ji ber xebata vêder li hember împeryalizmê, sehyonîzmê û kevneperestiyê ye.

Kurd tê de ne. Bizane ku xebata me parçeke ji xebata pêşverûyêñ Ereb e. Ew efser gotina min birî û pirs kir:

- Hun Kurd bi Yekîtiya Ereban re ne ?

- Belê em bi Yekîtiya Ereban re ne, bi serekîtiya hêzêñ pêşverû û demokrat, ji ber yekîtik wisa hêz e û alîkar e bo tevgera şoreşgêr li Rojhilata Navîn, em ne li gel Erebêñ Emerika ne, ez dixwazim ji te bipirsim:

- Tu li gel îrûbeta Fehid û Mubarak û Qabûs û Sedam î ?

Yekser wî got.

- Na evana ne Ereb in, noker in, dost û nokerêñ Îsraîlê û Emerîka yê ne, evana dijî şoreşa Filestînî ne.

Dîsa min got.

- Li aliyê me jî kevneperest û kompirator û dûvik hene û em diji wan in, pişti min bo te hin tişt diyar kirin, divê bi hev re xebat mafêñ me pêkbînin û biratiya xwe te kûz bikin. Welatê xwe biparêzin di riya demokrasî de, hîn gotina min negîhabû dawî denge çend bomban ji nêzîk derket ci-hê em lê bûn hejiya xatir ji efser xwest. Pişti wê me çend car hev dît û pişti baweriyeñ me nêzîkî hev bûn, bûn dost.

Berî em hemî ji Berûdê bikişin, me dîsa hev dît, dostê min got:

- Ez bi gelê we re me, ezê xebat bikim bo pêkanîna mafêñ we. Me xatir ji hev xwest û soz da hev ku li welat hev bibînin.

KURTESERGUZEŞTEY JIYANI

GORAN

Sorugêr Eskeri

Goran, nawi Abdula Beg, Kuri Sîlêman Beg, kuri Abdula Beg e. Le Şari Helebce - ser be Parêzgayî Sîlêmani - le sali 1904 ya 1905 hatote dînyawî. Goran nek her xoy behrey edebî hebuwe, belku bawkişîw bapirişi behrey edebiyan hebuwe w be zîmani kurdi w farsi nusîwyane w wîtuyane. Be taybeti Bapiri, ke (Goran) i be nawewe nawnîrawe, le zîman û edebî farsi da destêki balay hebuwe, we her boyeşê be (Nuseri Fars) le qelem dirawê.

Le binemaleyekî Mirani Beg (Begzade) buwe, le nawçey Meriwan. Bapire Gewrey Goran ke nawi "Eynayetulla Beg kuri Emanuwêlla Beg" buwe. Be xoy û xêzanekeyewî hatote nawçey Sîlêmani w le Qerax maweyek niştecê ebîn. Zori pênaçê koçiduwayiy eka. Ebdulla Begi kuri (Bapiri Goran) be

xawxêzanewe, ke pêkhatibû le birayeki biçuki, dayki, jinekey û minalekani, ruwekene Helebce. Çunke xoyan be "Caf" zaniwe, her lew sefere da dayki w birakey be nexoşî (sêbero) emîrin. Ewani tûr le Helebce niştecê ebîn. Ebdulla Beg xoy û minalekani ke emane bûn: Mistefa Beg, Nûri Beg, Nefî Xan, Sîlêman Beg, Hebibe Xan. Le mane Nefî Xan şuweka be Mecid Begi Ussman Paşa. Hebibe Xan şuweka be yekê le Şêxani Xaneqay lay Pawe. Mistefa Beg û Nûri Beg kesyan le duwa be çênamênê. Belam Sîlêman Beg em minalaney ebê : Eli, Şemse, Muhammed, Ebdulla, Eli w Şemse be lawî mîrdûn. Bawki le sali 1919 da emîre w Muhamediş ke be nawbang buwe be "Heme Bege Rûşê". Le sali 1921 Ekûjî. Bem çesne lem binemaleye her Ebdulla Gorani herdem zindû emenêtewê.

ZINDANI EJDEHAK

(bo bîtekani faşizm)

Ejdehak ! Zîndanî qela qela ye;
Diwari konkürêt, dergay pola ye.
Ejdehak ! Kun bire, sexte zîndanî,
Naruşê be bîrbend bendi Giranî !
Hêzi leş mirêne kot û zincirî;
Kariye le demar napaki birît.
Dil reçit her tawe çesne sizaye
Bo bendi xawen hoş exate kaye.
Hend çesin serbir û zîndanewanî,
Serxoş in be xuwenî gişt bendiyekanî !
Ejdehak ! Ey dêwi le (bir) zirawçû,

Ey naştay maranît be mîşik kirdû !
Ew mîşik tazaney zincirî kirdûn,
Le lêwi pêçali marga ratyirtûn,
Çawerîyi fermanîn berêyi hehata
Bibrêne ber tenaf le norew kata,
Mêşkiyan, amancıyan, hiwa w taseyan
Le peta bitasê wek henaseyan !
Emane gişt eron, eyanrewêne,
Hiç nebê le benda eyanrizêne...
Belam to, Ejdehak, le helpey xorak
Natîwani bikewi bo mari napak,
Her eguri, ekiji, edey le gerdin,

Mîşik derxward edey be mari newsin...
Ta roje ew xuweney be naheq riştîr,
Eew birey wat zani ecgari kuştit,
Taw eden tenuri demari Kawe,
Ew çekuş weşeney role kujrawe
Exiroşê w ecoşê w Komel yek exa,
Her helsay ebini zîndanî ruxa !
Eew hele her lawê le zîndan ta mîrd
Eebête amyey bex bo netewi Kurd;
Le binkey peykeriya enusîre nawi
Le gel gişt Kirdewey pesend kirawi !..

GORAN

Goran lay bawki quran û seretay xuwendini xuwenduwe, le "Mizgewti Paşa" y Helebce buwe be feqê w tenanet maweyekiş be "Feqe Ebdulla" nasrawe. Le serdemî Turîk da ke yekem, xwendîngî le Helebce kirawetewe le polî yekem wergirawe. Her weha le serdemî dagirkirani Englîz da, polî Çuwâremî le Helebce tewaw kirduwe. Dewami le xwendîngayî Resmîş da piçir piçir buwe. Muhemed Begî biray pêş kujrani, Goran le gel xalozayeki da enêrê bo xuwendîngay Zanistiy Kerkuk. Belam paş kujrani birakey derameti guzerani xuwendini xoy û jiyanı daykî nabê. Le ber ewe dest le xuwendîn helegirê. Le salani 1922 ta 1925 jiyanê ki bê deretan eçêjêt.

Goran bo yekem car le sali 1925 da be mamos-tayı le xuwendîngakani Helebce damezrawe w ta sali 1937 le xuwendîngakani ew nawçeye da mawetewe. Paşan guwêzrawetewe bo Eşxal - Beşî karûbarî Rêgawban. Mawey çend salêk le gel çen Roşinbirêki tiri Kurd da çawe bo YAFA, le Ezgey Raduwêy "ROJHELATI NİZİK", beşî Kurdistan ekenewe, be mebestî besdari xebat le diji faşizm, her le Eşxal da emênenê tewe.

Le Tîşrîni duhemî sali 1952 ebê be berpîrsyari rojnamey JİN. Ta eyluli 1954 le ser em kare emênenê tewe. Le mangi 9 -1956 eçete Bexda, çen rojêk lewê le yekê le piroje dewletiyekani xanûbereda ebê be lêpirsrawi kûrêkaran. Le paşan mangi 8 - 1958 le gel Nuwênerani Niştimani da ser le Yekêtiy Sovyet û Çini Millî w Koryay Dimokrati eda.

Le seretay 1959 da serperîsti govari "Şefeq" i girtote dest û be nawi "Beyan" deri kirduwe w le iskani Silêmanî da emezrê ta nawerasti 1960 kari-tya kirduwe. Enca bê bîyanuy ewey ke giwaye bêpiş kari becêhêştîwe le ser kar la ebîrê "Kar becêhêştinekey bo çûn biwe bo Şeqlawe, bo besdar bûn le Kongrey duwemi Mamostayani Kurd). Le nawerasti sali 1960 da dête Bexda w ebê be mamosta. Le beşî Kuri Kolêci Adabi Zankoy Bexda w eşbê be endami destey nûserani rojnamey AZADI.

Le seretay sali 1962 da janesik zori bo ehênenê, Paşan derekewê ke Gedey tûsi nexoşî (şêrpence) buwe. Emeliyatêki le Bexa bo ekrê. Paşan le Nisan da eçete bo Mosko, sê mang le nexoşxaney (Kremlin) û Senetoriy (Bervêxe) besereba w egerêtewe bo Eraq. Paş geranewe bermaweyeki kem nexoşiyekî heledatewe, tengi pêheleinê. Le ber ewe egerêtewe bo Silêmani w le wê lenaw cêda ekewê, le katjumêr 9,30 serlebeyani 18.11.1962 da çawi be yekcari enê tewe w koçi duwayi eka.

Goran sê car le jiyanî da girawe. Bo yekem car, le sali 1951 ta tiştini duhemî 1952, bend ekrê. Le 17.10. 1954 bo duhem car egirê, le gel komele le aştixwazani Silêmani, sizay salê zindan w salê xistîne jêrçawdêri polisi be sera edirê, mawey zinda-niyekey, le bendixanekani Silêmani, Kerkuk, Kût, Baqûbe w Nugreselman û mawey jêrçawdêriyekeşî le Bedre, besereba. Bo cari Sêhemîş, le hêrişeyekî Mirî da, boser niştimanperweran, be boney destdîrîjiye sêqoliyekey ser Mîsîr ewe egirêtewe le 17.11.1956 da, dadigay ûrfî le Kerkuk, sizay sê sal bendi yan be barimte danani hezar Dinar û ta sê sal wirtey way le dem neyate der û kurdewey way lêne-weşêtewe, ke miri pêy dilgiran be.. Goran ne hezar Dinarekey ebê w ne eşywê gifti wa be miri bîda, le ber eme exirê te bendixanewe ta 10.18.1958 mawey em sizadaneşî le zindanekani Kerkuk û Baqûbe be ser birduwe.

Berhema Honıraweyiyekani Goran, ke takû êsta kewtunete pêş çawi xelki w bilawkirabînew, be têkrayî le Diwanêka be anwi (Diwani Goran) sercemi berhemî Goran da ko kirawnetewe w bilaw kirawnetewe tenha çuwar parce honırawe nebê. Ke têkray Diwanekêş le (13) Komele pêkhatuwe ke emaney xwarewen.

1- Beheşt û Yadigar, seretay em Komeleye Mamosta Goran xoy nûsiwyeti - 25.6.1950 - Hewlêr. Le seretay em Komeleye da Goran çend ştêki besudi ron kîrdotewe - Le seretay helbestini honırawekani da, be wezni Erûz şan be şanî wezni Pence (Hica) Desti pê kirduwe. Belam le kotayı da wazi le wezni Erûz hêname w her be wezni Pence helibestun. Çunke be ray mamosta Goran wezni pence le gel dariştîni zimanekeman ziyatir rîk ekewe w wezni taybeti neteweyi ma ne, ta wezni Erûz.

2- Firmesk û Huner le gel Du Hawine Geşt.

3- Sıruşt û Derûn.

4- Lawîk û Peyam.

5- Le Kori Xebata.

6- Operêt.

7- Piyêş le yek perdey Korta.

8- Şîri Gep.

9- Sırûd.

10- Şîr Bo Mînalân.

11- Wergêrîraw.

12- Bo Zaxawi Mêşk.

13- Hemecore.

LE BENDIXANE DA

Axîrin mali jiyanum kunci bendixane ye,
Em kelepçe merhemi zami dili dêwane ye.
Zor demêk e çawerwani zırzirey zincir ekem,
Sevri em zincireken, wek zêweri şahane ve.
Bûki azadim ewê, xwênim xenes bo dest û pey,
Helqe helqey pêwenim, bo pîlpile w lerzane ye.
Gerçi dujmîn wa ezanê min be dili lal ebûm
Baş bîzanê kunci zindanîm qatabixane ye.
Biri azadim le zindana firawantr ebê,
Qurr be ser ew dujmîne, hiway be bendixane ye.
Girtin û lêdan û kuştin'amîli azadi ye,
Top û şestir û kelepçe, lam wekû efsane ye.
Çawerwani şorîşek im'alemê rizgar bika,
Milletim bo ew mebeste kirdewey şérane ye.
Çeki şorîşgêri min, nûsin û bir û bawere e,
Raperin e, helmet'e, pir n'eretey Kurdane ye.
Ger be azadi nejim, mûrdin xelat e bo leşim,
Nokeri w serdanewandin kari namerdane ye.
Qan'ı im emro le zindana, be azadi ejim,
Sed hezar lehnet lewey wa nokeri bêgane ye.

Qan'

SINÛR

Ey ew kesey detperestim û lêm wîni
To xuda niy, to xoşewisti mini.

Le asman niy ta wêtranega destim,
Le qaf niy kaley asnit bo helbestim.

Toy le min wîn kird û mini le to dûr,
Ew bistrokey dujmîn nawi na sinûr.

Hêmin

BESTEY DILDAR

Le jêr asmani şina,
Le pal lütkey befrina,
Kurdistan geram,
Dolaw dol pêwam,
Ne le şar û ne le dê,
Nemdi kes
Wek to ciwan bê
Toyt û bes.
Kiçe kurdêk dil pêy şad bê,
Wek fîrishte w perizad bê.

Ne bariki, ne goştin
Ne kıçoley, ne şajin,
Ne zor çaw reşî,
Ne ecgar gesî,
Belam be nigay şîrin,
Nemdi kes
Wek to be tin,
Toyt u bes.
Lêt bê bizey mange şewi,
Bejni rêk û rewti kewi.
Qibley ayin û bawerim,
Xway beheşti dili terim.

Wek sereroy şwêñ amanc,
Ne Zaza ma ne Kîrmanc
Geram Kurdistan,
Germyan û kwêstan;
Ne le şar û ne le dê,
Nemdi kes,
Wek to ciwan bê,
Toyt û bes.
Kiçe kurdêk wek gul wa bê,
Kurdistani pê awa bê.

Goran

EWPERİ TİNWÊTI

Maçit dekem
Ey giyani xom maçit dekem.
Qorti çenaget maç dekem.
Nermani gwêt,
Goy memkekanit maç dekem.

Zor tinûtım
Le gel ewey, çak dezanum,
Memkekanit wek tope xwê,
Ta maçiyân kem,
Nemami zerdi tinwêti
Le eskim da pîtr derwe!

Ey giyani xom:
Le yekem korsi ewin da
Memkekanit fêryan kirdim,
Rêzi befri çiyakan bigrim.
Çawekanit fêryan kirdim,
Rêzi kaniy binarı şaxekan bigrim.

Demewe bigerêmewe
Bo ser textey qatabxane:
Çawerêt kem,
Le duwem korsi ewin da,
Fêrim bikey memkekanit biparêzim,
Fêrim bikey çawekanit biparêzim.

A. Pêşew

DIMILKİ DI DAÇEK



Daçek (preposition, herf-i izafe, edat, bernav): Dımulki (Zazaki) di tay kelimey esfē kı xoser ma-na yini çına labrē naman reydi şuxulēne û kerdiş yan zi biyayışē naman nawnenē, tira daçek (pre-position) vajiyēno.

Daçeki dı grüb ê

A - Daçekē kı naman ra ver yan zi naman ra pey yenē. Niy daçekan ra tay yew kelima ra viraşte yē, tay zi dı keliman ra viraşte yē. Cēra ma niy daçeki û mana yiniya Kurmanci (Kirdasi) nuştâ û ma her-yew daçeki cumla miyan dı nawita.

- 1) bē-: Kurmanci dı: bē- / Bē keye mend.
- 2) -bē : bı / Keynekı fek**bē** xo vato.
- 3) bēxeyja (bēxeyra): jı xeyni (jı xēnc), jı...pē ve, jı bil... / Bēxeyja di tifungan çiydē ma çinē bı.
- 4) bı- (be-): bı- / Bı peranē xo erinawo.
- 5) bina (bin ra): bin, jı bin, (jı bini), dı bin... re / Vaştıri vaşı bin ra kerdı.
- 6) bin dı: li bin, dı bin / Darı bin dı mendo.
- 7) cēra (cēr ra): jı jēr, li jēr / Cēra, va ameyni.
- 8) coka: jı ber... (jı ber ku), jibo, jibona / Lajē yay ame, coka keyf kerd.
- 9) cora (cuwera): jı ber... (jı ber ku), jibo, jibona / Nêweş o, cuwera rakewto.
- 10) cora (cor ra): jı jor, jor de / Dı xorti cora yenē.
- 11) cor dı: jı jor / Dı xorti cor dı yenē.
- 12) -de (-di): h, dı...de / Deşti de vaş yeno.
- 13) demew (demewo kı): di dema, dema ku / Demewo kı Herbē Şêx Seidi bı, Eskerê Tırkan dewa ma veşnay.
- 14) -dē : jı, jı...re / Keydē xo ra nêvejiya.
- 15) -di (-de): li, dı...de / Dewi dı mend.

- 16) dim, dıma: dû, pey, paş, paşı, piş, piştı, dı paş, (dı pē), li paş, li dû, jı dû / Lajeki dıma keyne-ki amey. Lajekan, keynekan dıma kay kerd.
- 17) dır (-der): li, dı...de / Dewi dır estora ma bi.
- 18) ebi (eve, bı): bı- / Ebi des peyan rayir kewt.
- 19) gama (goma kı): gava / Gama kı cendirmey amey, gedey tersay.
- 20) herrında (herunda): li cihē..., dı cihē, li şüna / Herrinda mu dı ti bibiyini ti ka sekeri ?
- 21) heta, hetana, hetani: ta, heta / Hetani şan waneno.
- 22) het, heti (het dı): ba, bal, cem, rex, nik, li ba, li cem, li nik, li rex, li tenışta... / Mı nêweşi heti pawit.
- 23) het ra: jı cem, jı rex / Kekoy het ra yeno.
- 24) heya, heyana, heyani: ta, heta, heya, heyani / Ez heyani Siweregi şona.
- 25) kiştı (kiştı), kiştı dı: li cem, li rex, dı tenışta... de, li tenışta... / Kiştı dı weno, orte dı rokuweno.
- 26) kiştı ra: jı cem, jı rex / Kiştı ra girewt, berd.
- 27) lewey (ley): ba, cem, rex, nik / Şı lewey xalē xo
- 28) miyan, miyanē (miyandē): nav, dı nav, dı nav... de / Miyanē dewijan dı mend.
- 29) miyan ra (miyana): jı nav, dı nav re / Miyan ra şı.
- 30) miyan dı: dı nav...de / Birayan xo miyan dı bari kerd.
- 31) -na: jı...ve, jı...vir de (jı...de) / Rewna varan nêvarawo.
- 32) -na (-an ra): jı, jı...ra (jı...an re) / Ceniyana (Ceniyan ra) persa.
- 33) ne tê da: ne tê de, jı xeyni..., jı... pê ve (jê pê-

- ve) / Tı ne tē da, ez ay binan nē şinasneno.
- 34) nızdi (nuzdi): dı nēzi...de, dı nēziki...de, li nēzi (li nēziki) / Nuzdi e dewi dı Roy Deşta Hajiyian esto.
- 35) pa: tevi, bı...ve, bı...re / Ey to zi pa, pencəs teney medē.
- 36) pa bı: tevi, bı...ve, bı...re / Pa bı gay to ra, çeher gay weyca dı biy.
- 37) pey: paş, pişt, piştı, paşı / Pey banē ma dı yew tuyeri bi.
- 38) pey, pey bı: bı, bı...ve / Pey bı peran gurey xo viraş.
- 39) pey dı (pey de): li paş, li pey, pey, dı paş...de / Pey dı mendo.
- 40) peyni, peyni dı (peyni de). li paş, li pey, dı paş...de / Berano wurdēk peyni di şono.
- 41) pey ra: jı pey, dı pa re / Pey ra kaş kerd.
- 42) qandē (qandi): bo, bona, jibona, jı ber... / Ez qandē to vana.
- 43) qay (qaydē): bona, jibona, jibo / Qaydē mi ri raşt vaje.
- 44) -ra: jı-/Kam keye ra ame ?
- 45) -ra cér: jı jér / Ko ra cér deşta duzu bi.
- 46) -ra cor, li jor, dı jorē...de / Kergi aw wena, xo ra cér hewnēna.
- 47) -ra pey: pey...re, dı pē...re, pey / To ra pey kam yeno ?
- 48) -ra ver. li ber, beri, jı beri, li pēş / Bawo, dayı ra ver sı.
- 49) reydi: bı, bı...re (pē re), digel, tevi / Kergi ha liçikan reydi qut wena.
- 50) reyra: dı gel, li gel, tevi / Wa to reyra bero.
- 51) -rē (ri): jı...re / Ma rē vano. Ma ri ardo.
- 52) -ro: bı...de / Bıradē mi ro birra.
- 53) seba: seba, bo, bona / Seba çiy nērot ?
- 54) semedē: seba, bo, bona, jibona, semed / Semedē weletē xo dekewt hefs.
- 55) semedo kı: jibona ku, semedē ku / Semedo kı feqir bı, nēşina şero mekteb.
- 56) semed ra, jibona, jibo, semedē / Çı semed ra vinderto ?
- 57) ser, sere: ser / Ez veciyaya bani ser.
- 58) sera (ser ra). li ser, dı ser...re, bı ser...de / Ser dı paçē xo leqna.
- 59) sere dı: dema, dı...demē, dema...de / Hemini ay sere dı wendini.
- 60) serew (serew kı, serewo kı): dema..., dı dema... / Serewo kı ceniyan kay kerdnē, yē luli cenayni.
- 61) sero. ser, li ser / Bani sero ronışto.
- 62) ser ra (sera): li ser, dı ser...re / Awkı ser ra vindert.
- 63) seveta (seweta): bo, bona, jibona, seba, semedē / Seveta ma ra nēwazeno.
- 64) tede: tē de, dı...de, bı...re (pē re) / Yew kerdiya çerkezi tede bi.
- 65) tedir (tede): tē de, dı...de, bı...re (pē re) / To tedir qali kerdö ?
- 66) tey, teyi, tē: dı gel, dı...de, pē re / Tı zi tey şoni ?
- 67) tra (cira): jı...ve, tē re / Derzinu tira şiya.
- 68) tiro: dı...re, tē re, tē, pē / Destē xo tiro kerd.
- 69) ver: ber, li ber, beri, li pēş / Ma ra ver damı esta.
- 70) vera (ver ra): jı ber, dı ber...re / Ver ra viyart.
- 71) ver bı: ber bı, ber bı...ve / Ver bı hēgay raymend.
- 72) ver dı (ver de): ba, cem, li ber, li rex, li ba, li cem, li nik, dı tenışta...de /
- 73) verni, verni dı (vernı de): li ber, li pēş, dı pēş / Verni dı kam vinderte bı ?
- 74) verni ra: jı berē de, jı berē ve, jı seri / Verni ra heyani peyni cıtı kerdı.
- 75) vero (ver ro). bı...re, li kēleka / Vero sı kı qali bikero.
- 76) zere, zerre, zerrey...: hundır, dı hundire / Ramit zerrey keyi. Zerrey keyi veng kerd.
- 77) zerre dı: dı hundire...de, dı...de / Zerre dı mendo.
- 78) zerre ra: jı nav, jı hmndire ... / Zerre ra vejiya.
- B - DAçekē kı dı parçan ra viraşte yē. Niy daçekan dı, parçew yew nami ra ver (preposition), parçew bin zi nami ra pey (postposition) yeno.
- 1) beynatey... dı: dı navbera..., nava... / Beynatey min ü to dı çiesto ?
- 2) beyntarē (beyntardē)...dı: dı naybera, dı navbeyna / Beyntarē deşt ü koy dı gomey mawo rijnyaye bi.
- 3) bı...bē: bı / Keynekı bı fekbē xo vato.
- 4) bı... dimi: li pey, li dū / Bı golikan dımı sı.
- 5) bindē... dı: dı bin...de / Bindē to dı doşek esto?
- 6) binē... dı (binē...de): dı bin...de / Binē kerran dı mendo.
- 7) binē...ra (bindē...ra): jı bin / Binē vaşı ra vet.
- 8) bı...ya (be...ya), bı...ra: bı...ve, pē ve, bı...re / Mērdek bı yew ceniya amewo.
- 9) cadē... dı: dı cihē...de, li cihē, li şuna / Cadē sı ma dı yewerna bibiyini bermayni.
- 10) cawo...dı: li cihē (li ciyē) / Cawo berz dı vindert.
- 11) cay...dı: li cihē..., dı cihē...de / Cay ma dı vinderto
- 12) dı... dı: dı...de, li / Dı verniya to dı ame.
- 13) Heta...ra: ber bı... / Heta embazan ra şo.
- 14) hetē...ra (heti...ra): ber bı... / Hetē mi ra mey?
- 15) heto...ra: jı aliye...ve, li aliye..., jı aliye..., jı hē-

- la / Heto yew ra qali keno, heto bin ra şono.
- 16) kişt... di (kiştay... di): di tenişta...de, li tenişta, li rex / Kişt banê şima di yew tuyeri bi.
- 17) miyandê ... di (miyondê ... di): li nav / Miyandê hê gay di rona.
- 19) miyanê ... di (miyonê ... di): nav, li nav, di nav...de, nav...de / Miyanê bizan di kel nê mend.
- 20) miyanê ...ra: ji nav, nav, ji nava / Miyanê laje-kan ra, di lajeki weriştı amey.
- 21) qandê ..rê (ri): bona, jibona, jibo / Oandê to rê ame (Qandê to ame).
- 22) qay...ri (qaydê ...ri): bona, jibona / Qay şima ri (Qaydê şima ri).
- 23) pey...ra (pê...ra): di pişt...re, di paş...re, ji paş / Pey beri ra vejiya.
- 24) pey...ro: di paş...re / Pey koy ro şı.
- 25) piya bı...ra, piya...ya : bı...ve / Piya bı keye w kulfeti ra wena şiy.
- 26) semedê ...ra: bona, jibona, jibo, semedê... / Semedê şima ra nê girewt.
- 27) verê ...di, verê verdê ...di, verdê ...di: li pêş... / Verê banê şima di çi esto?
- 28) verniya...di: li ber, li pêşiya..., di pêşiyê ... de / Verniya bizan di şono.
- 29) zerrey...di: li nav, di hundirê ...de / Zerrey keyi di rokerd.
- 30) zerrey...ra: ji nav, ji hundır / Zerrey dësi ra veciya.

DIMILKİ Ü HEWRAMANI (GORANI DI ÇEND DAÇEK (PREPOSITION) I

Dimilki (Zazaki)	Hewrami (Gorani)
1) bê -	bê -
2) bê xeyra (bê xeyja)	xeyrû
3) bı (be), pey	bı , ve, we, pene, pey, pê
4) cêr (cir), cêro	cîr, cîr, cêrû, cêr
5) cêr di	cêrû.na
6) cor	çuar, çuor, açuar
7) di (de), dir (der)	ce, le, ci
8) dîma	dîma, dîmaw
9) ebi (bı, eve)	ebe we be, çeni
10) heta, hetana, hetani	ta ta ke
11) ley, lewey	la, lay laye
12) na (-an ra), -ra	-na
13) nizdi, nuzdi	nizik, nizikû
14) -ra	ci-, cih-, ce-
15) ser, sero	serû, ser, ve ser, aser, çuar, açuar
16) ver, vero, verê, verdê	ver, wer, wel, werû worû
17) ver bı	be, we, pey
18) verê, veri	werê, wele
19) zere, zerre, zerrey, zeredê, miyan, miyan di	dili dîlê, deleû, adili, deleû...na



C
E
N
T
E

M. Lewendi

Jinek ciwan di dadgehê de gîhyê miroveki dike. Hakim jê dipurse:

- De ka bêje, gîhyê te çi ye? Jînik

- Hakim efendi ez vi merivi gli dikim. Lewra li ber otobosan li sekinokê em ketin rêza bilêt kûrinê, wê gavê ev jînik ji li pêşiya min bû. Dor hat wê, çû ber gîsê(ciyê bilêt firotinê) ez ji li dû wê me, lê ez geleki lez dikim ku ez zû bilêtê bikurim û bighijim malê, ji ber ku mîvanen min li hêviya min in.

Hakim vedigere ser mirovi û jê dipurse:

- Te çîma xwest ku ev jînika bifetisanda û bikuşta, haa, de ka bibêje sebebê wê çi bû?

Mîrik radibe pê û dest pê dike dibêje :

- Hakim efendi, weleh rast min dikira ew bifetisanda û bikuşta, lê xelkê dora me ew ji destê min xelas kir an na minê ew bikuşta.

Hakim şâş dibe, metilmayı dimine û disa dibêje:

- È de ka hela bibêje jibo çi? Mîrik dest pê dike:
- Hakim efendi, seet pêncê

évarê bû, ez ji kar derketim, û seet di pênc û nivan de ji mîvanen min wê bihatana malê, ji ber wê yekê diviya ku ez hîneki zûtir biçyama malê. Ü min lez kir ez hatum ber sekinoka otobosan li sekinokê em ketin rêza bilêt kûrinê, wê gavê ev jînik ji li pêşiya min bû. Dor hat wê, çû ber gîsê(ciyê bilêt firotinê) ez ji li dû wê me, lê ez geleki lez dikim ku ez zû bilêtê bikurim û bighijim malê, ji ber ku mîvanen min li hêviya min in.

Vê jînikê destê xwe avê t ji çentê xwye mezinde, devê çentê mezin vekir, çentê ki piçûk jê derxist û devê çentê mezin girt, deve çentê piçûk vekir, ji çentê piçûk pere derxist disa devê çentê piçûk girt û devê çentê mezin vekir, çentê piçûk xist hundurê çentê piçûk û devê çentê piçûk girt û disa devê çentê mezin vekir çentê piçûk xist hundurê çentê mezin û devê çentê mezin ji girt.

Hakim hema radibe pê û dibêje:

- Te çîma nekuş, te çîma nekuş.....?

NAMEN XWENDEVANAN

Jî Redaksiyona Berbangê re !

Hevalên Hêja û Delal,
Ez ji welatê Yekitiya Sovyetis-
tanê gelek silavêن xweyi şoressge-
ri li we dikim û ji xebata weyi şo
reşgerire pêşveçûn û serfiraziyê
daxwaz dikim.

Hevalno, bî rasti derketina
Berbangê tişteki gelek xweş û
pêşveçûnek mezin e dî xebata ge-
lê Kurdistanê de. Dî bahweriya
min de pêvist e go her xorkeki
Kurd, welatparêz, demokrat û şo-
reşger kovara Berbangê bixwine
û alikariyê dî her hawayi de pêre
bîke.

Hevalno, ez xorkeki Kurd, we-
latparêz hazırlım go bî her imka-
nêن xwe alikariya we dî vê xeba-
ta we de bikim. Min heta niha du
(2) hejamrêن Berbangê xwendin
û ez gelek pê kîfxweş bûm go
kovareke wani (Berbang) bî zi-
manê kurdi tê nivisandin. Ev pêş
veçûneke mezin e. Bê guman wê
kêmasi çêbîbin û wê rexne (eleş-
tiri) lê bê kîrin.

Hevalno, ez disa dixwazim bi-
bêjum, gelek xorten Kurd li Yeki-
tiya Sovyet hene go dixwazin
Berbang bîghêje desten wan û
bixwinin. Yek ji wan ji ez im. Ji
ber vê yekê ez hevidarim go hu-
nê hejmarê kovara Berbangê ji
min re bişinin.

Dî gel silavêن şoressgeri li we
dikim.

Biji Azadiya Kurdistan,
- Biji berxwedana pêşmerge-
yên Kahraman
- Bimre Emperializm, Kolon-
yalizm û Faşizm
- Bîla hîlweşe diwarê faşizmê !

Şoress Fîrat

Biranî hêja û şerwerîn Kovara
Kurdiye BERBANG,

Hevalên delal pişta gelek silavan.
Hejmarê 9,10 Berbang ji aliyê hevale-
kî kewte destê min. Ez bi xwendina
van hejamrêن pir kefxweş û şâ bûm.

Brayên delal, ez ji we dixwazim ku
ji hejmara yek (1) heta heyşt (8) ji bo
min bişinin. Her wisa hejmarên pişî
deh (10) ji bo min her gavan bişinin.

Eger nivîsîna min bi kurmançî û bi
pîten Latînî pîr baş niye ji, ji ber wê-
ye ku zaravayê min Soraniye û ez dix-
wazim ku zarava kurmançî û nivîsîna
Latînî fîr bibim. Eger dikarîbin pîrtûk
û kovar û rojnameyê Latînî - Kurdi ji
bo min bişinin, şadî û serfiraziya we
armanca min e.

Her bijîn bo Kurd û Kurdistanê.

Ahmed Şerifî

Hevala delal û nazik Berbang !

Birayê te Civanê Gulan dixwa-
ze ji tere vê helbestê diyarı bike
ji bo hatina sala te ya duyemîn, û
ji tere jîyanike bê westandin hê-
vidare.

Ev helbest ji li ser birayê te
hatîye nivisandin û wîna lome
dike.

KEÇA MIN

Xorto.... !

Keça min guleke sore...

Diyarı te dikim... fermo...

Bêhna wê çawa ye ...? bêje min xorto..!

Ez dizanım... xwîn bêhna wê ye.. !

Keça xwe xweş nasdikim hevalo ..!

Min wê dî nav stiriyen û bomban de

Xwedîkîriye...

Erê hevalo... delalo... ma gûnehê min çiye

Bav û kalê min wisa min hin kirine...

Min hin kirine bê pêlav birê kevîm...

Û ji bo wê ez fêri stirya bû me..

Min hînkîrine dî zaroktiya xwe de

Hilgirtina tifingê ...

Xorto. !

Tu hêviya çi ji min dikê ...?

Dayîkek zarokan bêne ji bo bazdin

Jî birûzkê çile, yan ji bobiharê ...

Jî Redaksiyona Kovara
Berbangê ra

Hevalno.


Bî silavêن dîl û germî ji xebata
we ya hêja ra serkewtin dixwazin
û daxwazîya me her pêşa çûyîna
tîkoşîna gelê Kurd dî hemû warê
de gavên girîng avêtin e.

Ez nivîsa han ku Komela me ji
we ra bi tê kîriye, mîna ku jê ji
tê zanîn li himber kîrinê dewle-
ta kolonîyalîst û nîjadperest ku
yek ji li vî welatê da pêk hat Li
himber viya ji li cem xebatên di-
nê na yek ji Komela me nivîseki
ji vê şand. Ji hemû kovar û rojna-
man ra şandiye. Ku imkanê di
Kovara BERBAG de ji hebî be
em gelek kîfxweş dibin.

Navnîşana binê nivîse bi navê
"Alîkarê ALA RÍZGARÍ yê
AVÜSTİRYE" yê. Ku bi vî navê
ku ne vêşandin anjî şertê vî tu-
nebe hûn dikarin bi navê "KO-
MELA ÇANDÎ KURDISTAN Lİ
WIEN" ji bavêşînin.

Bi hemû silavên hevalî û piş-
girtibûniyê...

Civanê Gulan



ÇEPERAST

- 1- Beri, çol. - Vadi, nabêna du çiyan an ji çemê hîşk.
- 2- Din, mezheb. - Biber. - Dî Elif-bâ erebi de xwendîma tipeki.
- 3- Jî bo hêlinâ kevroşkan tê gotin. - Kulilkek.
- 4- Şûbe. - Ro, robar.
- 5- Awaz, gufte.
- 6- Tewirek çûk, çivik (berepaş). - Eşirek li heremê Cizirê ne.
- 7- Xatire, yadkîrîn.
- 8- Xwedan nenasî. - Şohret, nav û deng.
- 9- Dî çiroka Mem û Zin de wela-tê Memo. - Ne roni. - Cot, du heb
- 10- Xirabe, kavîl. - Loqme.

SEREJÊR

- 1- Bî sorani vadi, newal. - Tepe, qotê çiyê, gaz. - Bê wê jiyan na-be.
- 2- Xuyayı, şop. - Bî sorani "dibê-je".

3- Binê çiyê.

- 4- Kesê bê av mayi. - Kevirên mezin, zinar. - Bî erebi'ez,
- 5- Noteyek (berepaş). - Kesê ku-jin an mîrê wê miribe jêre tê go-tin.
- 6- Tûj, har, jêhati, jir. - Hejmarek
- 7- Lî heremê Turkiyê û Kurdistan ê dewletek kevn. - Xwediye kar an fabrikan (berepaş)
- 8- Dezi, ben. - Bî farîsi rî.
- 9- Şax. koy, kwêstan (berepaş). - Dî heftê de rojekmûyê wec (be-repaş).
- 10- Bî sorani "li vir". - Bî dîmili 'çû' (berepaş).
- 11- Dî kimyayê de kurte nîvisa Manganezê (berepaş). - Alim, ro-nakbir (berepaş).
- 12- Dini, mezhebi. - Dî kimyayê de kurtenivisa Nikelê (berepaş). - Wek, mina, hinek ji bo rengpişe ango sifatê ji bî kartının.


Dûmahiha rûpela 9. an

An bi kurtebirî em kanîn bêjin, ku se-net û edebiyat dibe malê civatê. Em di vir de mînakeke ji Mayakovski bîdin.

Mayakovski tu caran berî şoreshê pesnê dewleta Üris nedida. Wî her dem li hember dewletê û ji bo çîna karker û sosyalizmê dînîvisand. Lî piştî şoreshê, Mayakovski helbesteke bi navê "Pase-porta Sovyet" dînîvisine. Helbest li ser gerek wî, ya welitekî kapitalist e. Gava ku polisê wî welitekî kapitalist çav li paseporta wî û das û çakûçê li ser pa-seportê dikeve, çavên wî beloq dibin û ecêbmayî dimine. Hemû rîwiyen din, yê ezerîkî, ingilizi, swêdi û hwd. ber-dide. Lî tenê Mayakovski, ji bo ku ew ji welitekî sosyalist e bernade. Deh-panzdeh caran pelên paseporta wî di ser hev re diqlipîna û baş lê dinihêre. Mayakovski piştî wê gerê vê helbesta bi navê "Paseporta Sovyet" dînîvise. Çend xezikên dawi, yê helbestê wi-san e:

Baş lê binihêrin
Ü bixwînin
Erê
Hun ne şas in
Ez weliteyê
Welitekî sosyalist im. (14)

- 1- Mayakovski, şiir nasıl yazılır (hel-best çawa tê niûisandin).
- 2- Plehanov, Sanat ve sosyalizm (Senet û sosyalizm).
- 3- Letters without address art and social life (nama bê adres, senet û jîna sosyal).
- 5- Plehanov, sosyalist gözle sanat ve toplum (bî çavên sosyalisti senet û civat).
- 6- Plehanov, sosyalist gözle sanat ve toplum (bî çavên sosyalisti senet û civat).
- 7- V.İ. Lenin, sanat ve edebiyat (senet û edebiyat).
- 8- Min ev helbesta Ehmedê Xanî ji pirtûka Dr. Sivan, ya bi navê "Kürt Millet Hareketleri ve Irak' ta Kurdistan İhtîali" girt. Wî bi xwe ji kovara Gülistan, hejmar sisê girtiye.
- 9- Qanate Kurdo, Tarîxa Edebiyatâ Kurdi
- 10- Türkiye Yazarlar Sendikası, Toplatalan Kitaplar (pirtûkên ku hatine hevdan).
- 11- Cegerxwîn, Sewra Azadî
- 12- Ahmet Arif, Hasretinden Prangalar eskittim (min ji hesreta te qeyd kevn kirin).
- 13- Osman Sebî, Apo
- 14- Milliyet Yayınları, Ulke Ulke çagdaş dünya şîiri (ji wela-tan helbestîn dînîyayê ên modern).



BERSIVA HEJMARA 14 AN

SERPEHATIYA

OSPOVE

CAVORS

Zinarê Xamo

Reşo nixuryê diya xwe bû. Bêî wî çar bira û du jî xwehêن wî hebûn. Du bira û xwehek wî jî mîbûn. Mala wan li bajarekî Kurdistanê î biçûk bû. Erê bajar biçûk bû, lê gelek kevnare, şîrîn û hewqas jî xweşik bû. Xelkên navçê (qezê) hemûyan hevûdu nas dikirin û bi piranî jî merivên hev bûn. Zarotiya Reşo li vê navçeya biçûk û şîrîn derbas bû. Piraniya xelkên navçê û hemûyên cîranê wan wî nas dikir û wek zarokêن xwe jî, jê hez dikirin. Ev yek, ji ber jîrî û amlkiriya wî dihat. Wî, di heftsalîya xwe de dest bi xebatê kiribû û ji dê û bavê xwe re dibû añañkar. Mirov dikare bibêje, di van salên zarotiyê de dustana (debara) malê ketibû hustiyê wî. Ji ber ku bavê wî him feqîr û him jî bê sinet bû. Bêî vê yekê; li mal jî ne disekeñî, pir bi çola ra digeriya, yan jî karê qaçaxê dikir. Ev kar jî, him bi talûke û him jî gelek dijwar bû. Yek caran dihat girtin (ya li ser xetê yan li bin xetê) û bi menav ve, bi salan ve di gîrsîgehê de dima. Lewra jî divê wan bi xwe kariba debara xwe bikra û devxwari kesî ne buyana. Diya Reşo jinek pir bi qîret û jê hatî bû. Jibona xwedîkîrina zarokêن xwe wê, wek mîran li ber halê xwe dida û ne dihişt ku zarokêن wê herin desten xwe li ber tu kesî vekin. Evê her sal buharan biçuya gund nava bavanêن xwe. Li wir ji xwe re bizinêñ doşane danî û bi vî hawî, pê debara zarokêن xwena dikir. Bi vî şîklî, penê rê salê, rûnê salê jî ji xwe re dida hev. Li gel van, arduyê salî jî li gund dida hev û bi xwe re danî bajêr. Pişti temam kirina van hewcederiyan, wê dawiya payizê vege riya bajêr. Lîbelê li bajêr jî tu carî vala ne disekeñî. Yan ji xelkêre yan jî, ji bo firotanê gore, qazax û tevn çê dikir.

Ew demêñ ku diya Reşo diçû gund, ew pêre ne diçû. Wî li bajêr kar dikir û temiyêñ diya xwe yek bi yek bi cî danî. Tu ji ta û derziyê bigre, hetanî xwê hemû hewcedariyêñ mañî berî ku diya wî bê, wê bikiriya û li mal danya.

Ji ber vê xebatkariya Reşo, hemûyên cîranan û nasan bi serê wî sond dixwarin û ew bi tiliyan rê hev didan. Ew di nav heval û hogirêñ xwe de jî pir dihat hez kîrin. Reşo, jiyanek wisa derbas kir, bû xorî û diserde jî bûbû xwedî sinet. Lîbelê kulek, keserek di dilê wî de mabû ku, tu carî nikaribû jîbir bikra û ji dilê xwe derxista. Ew jî ev bû ku, wî jî wek hevalêñ xwena ne xwendibû û rojêñ xwendevaniyê weke wan ne burandibû. Dema ku wî, zarokêñ bi berdilkêñ reş, bi hustuvanek (jaxêñ) sipî û bi çentenê dibistanê didît, tavilê hîskînî dikşand û hêşir tije çavan dibû. Û di dûre jî ev pîşji xwe dikir: "Ma gelo çîma ez jî weke wan ne bûm xwendevan û ne bûm xwediyyê van tiştana ?" Ev pîşji her di serê wî de bû û tu carî jî nikarî bû ji bîr bikra. Bi vî hawî meh derbas bûn, sal derbas bûn, xweh û birayêñ wîna jî mezin bûn û gihiştin dema xwendinê. Lîbelê nêta bavê wan tunebû ku wan jî bide xwendin. Yekcarna ji Reşo re wisa digot: "Ma wê bixwinin ji min re bibin ci ? Ya baştır ew e ku, ji xwe re sine-teki fîr bibin". Û wê dom bikra: "Sinet bazine zê-rîne, hertim di dest meriya de ye". Reşo li hember vê dîtina bavê xwe derdiket û digot. 'Na, divê bix-wînin û zana bibin. Zana bibin ku, karibin rojekê bi kêri tiştekî bêñ'. Wê demê bavê digot: "Wele ez nikarim kesî bidim xwendin. Ji ber ku di dest min

de tişt tuneye. Hetanî ku li ba min hebe ez ê ji we re bînim, lê roja tunebû jî divê hûn karibin debara xwe bikin". Bi rastî jî bavê wan ne mirovekî çikos bû; heta tu bigre î comerd bû. Lê pir mixabin di dest de tişt tunebû û hewcedariya wî bixwe ji aßka-riya wan re hebû. Ev raberizandin - bira bixwînin yan jî nexwînin - her di nabê yna Reşo û bavê wî de dom dikir. Dawiya dawiyê, di rojekê ku bavê wan ne li mal bû, Reşo, birayê xwe î Fexro qeydî dibistanê kir. Di pê re bavê wan jî, ji vê yekê re tişt ne got. Reşo, ji bo xwendina birayê xwe çi ji dest dehat, qet derax ne dikir. Fexro di dibistanê de xorte-kî jîr bû. Ew her çiqas di sinifa xwe de, ne di nav refen başan de bû jî, lê ne di nav refen xeraban de jî bû. Wî, her sal xwendina xwe bi başî diqedand û bi vî hawî ruyê dê û bavê xwe, bi taybefî jî ruyê bira-yê xwe î Reşo dikenand. Reşo bi vê serkevtina birayê xwe ve gelek kêfxweş dibû û bi vî hawî kese-reñ dilê xwe direvand. Her çiqas yê dixwend û bê lukumandin bi ser diket Fexro bû jî, lê belî yê bi vê yekê difiriya û xwe wek xwendevaneñ his dikir Reşo bû. Dema Reşo, birayê xwe bi berdilka reş, bi hustuvaneke sipî û bi çentê dibistanê didît, per tunebû ku pê bifire. Wexta pê nûs, pirtûk û defter ji Fexro re dikirî, wek ku ji xwe re bikire pê şâ di bû. Xwendevaniya Fexro bi vî rengî dom kir, hetanî ku dibistana pênc sañ qedand. Pişti vê dibistanê Fexro wê dest bi dibistana nabê ynê (orta okul) bikra. Ev yek daxwaza Reşo ya ji dil bû. Ji ber ku wî dixwest ku birayê xwe di zanîngehê (universite) de bibîne. Bila ew jî weke hevalêن xwena here bajarêñ mezin û li wir bixwîne. Bila bixwîne ku, karibe bibe kesekî zana û tê giştî. Ya din jî Reşo, wê bi saya vê yekê, jiyana xwendevaniyê karibe bi Fexro re bijî û pê kesera ji dilê xwe derxe. Lewra jî Reşo, ji dil û can dixwest ku birayê xwe bide xwendin. Jibona pê kanîna vê yekê jî Reşo, karibû her tiştê xwe bida. Û ev daxwaza xwe bi hawakî eşkere, ji Fexro re jî digot. Pişti ku nê ta Reşo ev bû, ev dihat wê manê ku wê Fexro xwendina xwe bidomanda.

Dibistan li Kurdistana di bin işgala Tîrkiyê de, di meha Îlonê de vedibin. Ji ber vê yekê jî, ew kesen ku wê herin dibistanê berî wê·bi çend meha dest bi haziriya xwe dikin, tiştên xwena dikirin. Divê Reşo jî wek hemû kesî tividîrek ji xwe ra biggeranda û hewcedariyêñ birayê xwe berî ku dibistan veba, jê ra hazır bikra. Bi rojan da berhev da serhev û da-wiyê rabû ji buhar de berxek kirî. Bi kirîna berx, Reşo wisa difikirî. wê hetanî meha Îlonê li mal xwedî bikin û di dû re jî wê bi perakî baş bifroşin. Bi vî hawî jî wê karibin kincen Ferxo û pirtûkêñ Fexro bê teqîreq jê re bikirin. Lewra jî Reşo, ji alî peran de êdî bê qisawet bû. Ma ewê çima wisa ne fikirya gelo ?

Pişti ku berxê çavreş wek beranekî, di hewşê de

girê dayî û roj bi roj goşt digirt. Edî wê şayısa wî ji çi heba ? Nuha vatiniya herî mezin ev bû ku, berxê çavreş baş xwedî bikin û lê miqate bin. Ev yek jî ne geşek pire mezin bû. Bi vî şiklî, jî alikî de Reşo, temî li hemû dikandarêñ heval û hogirê n xwena kiribû, ku ji berxê çavreş re qalikê zebeşan û peşê xan û hişnayêñ din bidim hev. Ji aliyê din de jî, hin Fexro û him jî xweh û birayêñ wî yêñ dina, her roj ew dibirin li nav bexçan diçê randin. Edî kêt këfa berxê çavreş bû. Li ser mîzekirina berxê çavreş, tifaqek wisa di malê de hatibûn danîn ku, her kesî ji alî xwe de tiştîk ji çavreş re danîn û heta tu bigre jî lê miqate dibûn. Wî jî heqê vê mîzekirina dida û wek beranekî kel bi roja dihat. Erê hemûyê mal ji berxê çavreş hezdikirin û lê miqate bûn, lê belê tu kes ne wek Reşo bû. Ya wî edî ne hezkirin bû, bi serde dînbûn bû. Te digot qey berxê çavreş jî, bi vê yekê dizanibû û wî jî bi vî rengî ji Reşo hez dikir. Danê êvaran dema Reşo dihat mal, wê çavreş berda û hetanî ku her du ji hal de diketin, wê bi hev re bilistana. Di dema vê listikê de çavreş, lî dor Reşo dida çindika, ew bi seriya û Reşo jî bi her du destan wek du beranan dihatin hev. Edî wer bûbû ku, dema çavê çavreş bi Reşo keta, wê tavilê xwe lê rakşanda û bi seriya buçu-yayê. Van henekana dostaniya Reşo û berxê çavreş gelekî xurt kiribû. Her çiqas her duyan ji zimanê hevûdu fam ne dikirin jî, lê cardin karibûn bibin heval û bi hev ra wextê gelek xweş derbas bikin.

Rojen buharêñ bi vî hewî derbas bûn û meha Îlonê hat. Bi hatina meha Îlonê re xem û kederekê Reşo girt, ku bi şevan nikaribû xew bikra. Ew kûr û hûr difikirî û ji xwe re mitale dikir, gelo wê çawa karibe berxê çavreş bifroş. Lê belê tu rê jî, ji vê yekê re ne didît. Divê berxê çavreş bifrota û bi peren wî lê zimiyêñ Fexro tekûz bikra. Ji alikî Reşo rojen xwe bi van mitalan derbas dikir û ji aliyê din de jî vebûna dibistani roj bi roj nê zîk dibû. Yan din jî, edî Fexro jî dest pê kiribû di ber kekê xwe re davet û digot: 'Ma ka tuyê kinga çavreş bifroş ? Divê edî ez lê zimiyêñ xwe na bistînim. Wane hevalen mina gişa tiştêñ xwe na kirîne'. Reşo wê lê guhdarî bikra û bigota: "Metirse, hîn wexte heye".

Şeva şemiyê cardin ev dahke hate danîn û hemûyêñ maliya li ser firotina berxê çavreş, bîr û baweriya xwe diyar kirin. Dawiya dawiyê li hev kirin ku, wê çavreş roja duşemiye bibin mazatê (ciyê terş lê tê firotin) û bifroşin. Reşo sibê zû ji xew rabû, çû cem çavreş û bîstekê pê şâ bû. Ev listika wan, ya dawiyê bû. Wan ê careke din nikaribûya bi hev re bilistana û wek du beranabihatana hev. Ev yek ji alî Reşo ve baş dihate zanîn. Lê belê berxê çavreş ji hemû tiştî bê hay bû. Wî jî felekê bê hay, cardin weke hertim têr da çindika û bi seriya hate hevalê xwe. Reşo bîstekê fikrî û di dûre ban Fexro

û xweha xwe kir' "Ka werin, vî berxa bîstekê bibin nav bexça". Li ser vê gotina Reşo, her du zarokan benê çavreş destkê şî xwe kirin û ji cem Reşo dane rê'

Danê êvarê, her du zarok û çavreş, bi himê zek gîha û çiloyon daran ve vegeriyan malê. Berxê çavreş veke hertim bi nigê têxt ve girêdan û ew gîha û çiloyen anîbûn jî avê tin ber. Diya wan sifre raxisti-bû û şiv hazır bû. Giş bi hev re çûn li ser sifre rûniştin. Reşo diponijî û bê dilê xwe xwarin dixwar. Wê yekê bula diya wî kişand û jê pirsî: "Lawê min ma tu çima şiva xwe naxwî, û iwsa diponijî ?" Reşo bi serê zimên: 'Na tiştek tuneye. Jixwe ez têrim'. Di piştî şivêre demakê ketin şêwra û di dû re jî her kes vekişiya ser ciyê (nivînê) xwe. Reşo, xew lêgeriya bû, dikir ne dikir nikarîbû raketa. Ew ji xwe re difikirî, gelo wê sibê berxê çavreş çawa bi destê xwe bibe bavêje bin kêrên qesaba. Ev pirs, weke kurmekî hetanî nîvê şevê di serê wî de geriya û sekinî. Lê belê riyak din jî ne dît. Û divê wî bi destê xwe, berxê çavreş sibê bibra mazatî. Bi vê mitalê

di xew re çû.



Reşo, bi qâre qâra xweha xwe ya Zerûgê ve ji nav ciya hofî ser xwe bû û wek gulakê ji hundur pengizî. Zerûg li kêlek berata (laşê, termê) berxê çavreş sekinî bû, ji alîkî de hê sir (hê stir) wek tavê buharê dîbarand û di bera jî difîband û digot: "Çavreş xwe bi dar de kiriye, çavreş xwe bi dar de kiriye..." Ruh ji Reşo kişiya bû, dinya wek fîrsirokek zarokan li dor doş dibû. Dewxa wî diçû, dilê wî li hev diket. Ji wî wetnê, erd dihejiya, hewş bûbû hêlekan û ew jî wek tifalekî (zarok) heft mehî tê de hêj dibû. Demekê wisa mit û mat, di ser çavreş re sekinî û lî temaşe kir. Dû re bi destekî lerizokî, benê li nîgê (lingê) text geriyayî verşand û çavreş, wek diya ku zaroka xwe ya di xew re çûyî têke derguşê, li erdê dirêj kir. Taqet tê nema bû ku li piya bisekin-ya hêdika xwe bera erdê da û dengekî gelen nîzîm, weke ku ji binê zêrzemiyakê bê, jî berxê çavreş re got: "Evê te kir ne bext e ! Ma Fexro wê çawa dest bi dibistanê bike ? .."

SEVA RES

Hey şeva reş !
Şeva tarî,
Şeva kirêt !
Tifû, tifû
Li wê rûçikê te yê gemar û qirêj.
Te çawan em, xistin tarîfî,
Te sîsikên xwe berdan me,
Xwîna me mîtin hemî.
Ez nizanim,
Nizanim.....
Te ci ye, li me ev kîn û ev rik ?
Ku te deşt û çiya û newalêñ me,
Bi reş degirtiye tev.
Te ci yû war,
Li me kiriye qerbend û zindan.
Te gelî me xistiye
Korta xizanî, nezanî.
Te cila xwe ya reş
Avê tiye ser laş û çavêñ wan.
Te wan ji hev xistiye
Kiriye perçê, perçê.
Û wek kabûsekî gemar,
Tu dakeftî ser singêñ wan.

Û tu dixwazi
Ku xwfîna sor,
Biqerisînî di tehêñ wan.
Bi viya jî
Tu ranawestî,
Qîma xwe naynî.
Serda, bi dilbijokî
Tu dixwazî û dikî
Ku me di reşê xwe bipişêfî
Wek hemî goriyêñ xwe
Me jî wenda kî
Û jî navê rakî.
Tu xwe serkeftî û bextiyar dibînî
Kêf - xweş dibî,
Dil - şâ dibê bi ev yek.
Ji te tirê,
Tu wê karibî;
Vê kira xwe wer bidomînî timî.
Û bi vê holê
Tu wê bibî serî
Wê rîka xwe ya reş a bi tenî.
Lê tu ji bîr dikî;
Ku tu bê hîmî

Li ber tîsek ruhnî
Tu wê bilerizî û bikevî
Ma tu nizanî ?
Ku kin jiyan in şev
Nikarin bidomînin her û her.
Bi derketina spîdê
Ji navê radibin, dibin wen.
Û bi zan,
baş bizan !
Tu çiqas terî yû reş bî
Çenda tu wek
Dil û mîjîyê Evren bî.
Lê dîsa tu nikarı
Xwe rabigrî
Li ber tava zer
Tava bi tîrêj
Ya li şaxêñ welatê min
Hil bibe û bibe geş.
Tu wê bi hejî,
Ji hevkevî
Û bela - wela bibî
Wek mijâ li ber ba,
Berfa li bin tavî.



BERBANG
TUNNELGATAN. 14, 3 tr.
111 37 STOCKHOLM

MASSKORSBAND

Ahmet Hamdi Sarac
Forvägen 35nb.
145 50 NORSBORG

...ü greva göteborge

